

Ziman û Zar

salî sêyem_ jmare (7) (newrozî_2723) (beharî_2023)

Govarekî zimannasî ya werzî ye

Xudan îmtiyaz:

Dr. Teha Resûl

Sernivîser:

Fereydûn Saman

Sernivîserê fexrî:

tofîq wehbî beg

Desteya şîretgerî:

d.wirya omer emîn

d,hogir mehmûd

d.mizgim çali

kameran rehimî

îdris lawe

Rawêjkara kargêrî:

Evîn ehmed

Rawêjkarî Yasayî:

Salim Selman Kûbeçî

ji bo peywendî bi kovara ziman u zarî:

fereydunsaman61@gmail.com

00964 750 448 0493

Ziman û Zar

salî sêyem_ jmare (7) (newrozî_2723) (beharî_2023)


Govarekî zimannasî ya werzî ye

Serrastker: kûkman m.şilanî
dîzaynî nawewe: umêd mihemed
berg: aram elî
çap: 2023
tîraj: 500 dane
nirx: 5000 dînar
çap: çapxaney taran



damezrawey kerîmî eleke ê
navenda Xanî ji bo lêkolînên hizrî derdixe

The Location of Applied Linguistic on the science map

 By: Prof. Dr. Prof. Dr.
Abdullah Hussein Rasool

Summary:

This research concerns about the location of linguistics in general, especially applied linguistics on the science map. To achieve this aim it divides into two chapters:

At the first chapter, the researcher tries to answer these questions: What is science? What are the branches of science? What is the difference among pure science, humanities and applied sciences?

In chapter two, he talks about general linguistics, its branches, what is the difference between theoretical linguistics and applied linguistics? And what is the difference among their branches?

(Chapter one)

The definition of science

1- Introduction:

In ancient times, Philosophy was talking about all science, but nowadays every science talks about its materials or elements. According to these elements, science is classified into all these sciences, for example: Chemistry deals with the internal elements of materiality, but Physics deals with the external elements of materiality, for example, for the definition of water, Chemistry says: (Water is a material that is made up from two molecules of Hydrogen and one molecule of Oxygen.), but for the definition of water, Physics says: (Water is a material that has no color, taste and smell. It freezes at 100 degrees centigrade, and boils at zero degree centigrade.).

Since ancient times, scientists have been trying to turn the humanities into natural sciences, by finding fixed or standard units for their component elements, by creating smart devices to measure these

units, such as shown in this table :

As a result, (Every science is defined as the subject that investigates its components). According to these component elements, the sciences are device to three kinds, which are :

11--Pure sciences:

Pure sciences, or (natural sciences) are sciences that their component elements have standard units of measurement. Such as: Physics, Chemistry, Mathematics, Geology,

12--Humanities:

Humanities, or (Humanity sciences) are sciences that their component elements haven't standard units of measurement. Such as: History, sociology, psychology, politics, law,

13--Applied sciences:

Applied sciences, are sciences that use natural sciences in the service of the humanities. Such as: Engineering, Medicine, Agriculture, Industry, ...etc. for clarification: When someone has a pain, goes to a doctor. (Pain is an element doesn't has measurement, it means that pain is humanity element). Doctor hangs on, or cling some things, which are elements of pure science, such as, X-ray, blood pressure, (from physics), drugs, (from organic chemistry), that's how the doctor can treat the patient.

(Chapter two)

The branches of general linguistics

There are two analyses or expressions about general linguistics, one says that, general linguistic is the science which studies all languages in general, the other says that, it is an independent science which studies everything about the component elements of human

languages, their classification, how they work, what're their useful, and relationships....

(General linguistics thus includes the theoretical, descriptive and comparative biases of the subject. It is sometimes seen in contrast with those branches of linguistics where there is an interdisciplinary or applied orientation as in sociolinguistics, applied linguistics.) .

(Different branches may be distinguished according to the linguist's focus and range of interest.) . Thus, it divides into two branches, like in this diagram :

21--The difference between theoretical and applied linguistics:

Theoretical linguistics is a science that studies the appearance aspects of language component elements which are sounds and inner or interior aspects of language component elements which are meanings. Thus, the language consists of two elements: sounds and meaning, the sounds carry or tote the meaning and transfer from the speaker to listener, and these two elements (sounds and meanings) work by a system called rule or grammar. Accordingly, theoretical linguistics just deals with language component elements: sounds, meanings and their rules, based on that it studies the levels: Phonetics, Morphology, Syntax, which the main branches of theoretical linguistics, because sounds are the physical aspects, we can measure them (by Decibels and Hz), and it falls within pure science, but the meanings we can't measure them and it falls within humanities. Thus, the levels: Semantics, Pragmatics. Text linguistics, they're considered like a secondary branch, as shown in this chart:

Here an important and logical question appears, that is: When everyone knows their language fluently, what are the benefits of knowing all these things in theoretical linguistics? or what did we benefit from studying these things?

Applied linguistics appeared to answer this question. Applied linguistics as an applied science use theoretical linguistics in the service of the humanities. According to its service applied linguistics divided into two branches: if its service or studying doesn't exceed the limit of the language, that means using the information and results from theoretical linguistic researches in favors of language development, without mentioning any other sciences, it called main branch of applied linguistics, such as: lexicography, discourse analysis, stylistic, language history, dialectology, language conflict, language families, translation, course design, course evaluation, creative writing, bilingualism, multilingualism, as shown in this chart :

The secondary branch of applied linguistics, if its service or studying exceeds or overruns the limit of the language to the other science, such as psychology, sociology.... etc. then make new branches of applied linguistics, such as: psycholinguistics, sociolinguistics... etc. It means; when applied linguistics join together with another science, it makes a new secondary branch of applied linguistics. Such as: language philosophy, language and culture, language and media, language and politics, language and nation, language and acquisition, machine translation, machine writing, corpus linguistics, linguistic atlas, biolinguistics...etc.

Sources

1. David Crystal. 2003. A Dictionary of Linguistics & Phonetics. 5th ed. Blackwell publishing.

2. پ.د. عەبدوللا حوسەین رەسول. ٢٠٠٤. ئایا زمانەوانی زانستکی سروشتیە؟ یان ویژەییە. گوڤاری زانکۆی سەڵاحەددین. ژمارە (٢٢). ل ١٦١.

3. پ.د. عەبدوللا حوسەین رەسول. زمانەوانیی کارەکی. (٢٠٢٠). سەرۆانەکانی خۆیندنی بالا – دکتۆرا. بەشی کوردیی کۆلیژی زمان.

4. پ.د. عەبدوللا حوسەین رەسول. ٢٠١٥. چەند باسیکی وردی زمانەوانی – کوردی. بەرگی یەکەم. چاپی یەکەم. هەولێر.

- College of language. Kurdish department
- University of Salaheddin – Erbil

**GIRINGÎYA ZIMANNASÎYA
HIQÛQÎ DI PERGALEKA
HIQÛQÎ YA DADMEND DA**



Dr.Sabîr Ebdilahîzad

Puxte

Hiqûq wekî alava misogerîya dadmendîyê, di çavê zimannasan da, wekî pîşeya peyvan dihê naskirin. Ew pîşeya ku pîşekarên wê nikarin bêyî nasîna zimanî û bikaranîna wê zaniştê pergaleka hiqûqî ya dadmend ava bikin. Zimannasîya hiqûqî wekî zaniştêka navşaxî ango navbesta hiqûq û ziman, di heyama çend dehsalên dawî da, derîyên hiqûqê li ser zimanî vekirîne, bi awayekî ku îro delîlên zimanî bûne bingeha çareserkirina gelek dozên medenî û sizayî, bi taybetî di welatên pirziman û pirdîyalekt da.

Di vê gotarê da bi sûdgirtina ji şêwaza lêkolînê ya wesifî, mijarên sereke yên zimannasîya hiqûqî yên wekî dengnasîya hiqûqî, transkrîpsiyona hiqûqî, markeyên bazirganî, analîza hiqûqî ya destxetan, hilsengandina dozên penaxwazîyê û dîyarkirina danerê berheman hatine nîqaşkirin û hin dozên navdar yên têkildarî wan babetan jî wekî nimûne hatine pêşkêşkirin. Bêjeyên Sereke: Hiqûq, zimannasîya hiqûqî, delîlên zimanî, dadmendî, dengnasîya hiqûqî

THE IMPORTANCE OF JURISTIC LINGUISTICS IN A JUST LEGAL SYSTEM

Abstract

Law, being the essential instrument of ensuring the justice, is known to linguists as the profession of the words. It is such a profession that without knowing the language and the usage of linguistics it is not possible for the performers of this profession to establish a just legal system. Forensic linguistics as an interdisciplinary science, which is an interface between law and language, during recent decades has opened the doors of law to the language, in another saying, today lingual evidences have become a ground for solving a lot of civil and criminal cases, especially in multi-lingual and multi-dialectal countries.

In this article through qualitative research method, main subjects of

forensic linguistics such as forensic phonology, forensic transcription, trademarks, forensic analysis of manuscripts and evaluation of asylum seeking trials have been discussed, and some well known cases have been presented as sample items.

Keywords: Law, forensic linguistics, justice, legal evidences, forensic phonetics

Destpêk

“Li her dera ku civak hebe hiqûq jî heye” (Alîxanî, 1380: 3) û hebûn û geşedana hiqûqê jî girêdayî zimanê ye. Ziman, wekî yek ji taybetmendiyên mirovî, mijara sereke ya zaništa zimannasîyê ye. Berê qadên bikaranîna zimanî pir sînordar bûn; lêbelê îro roj tu qadên zaniştê nemane ku bêyî sûdgirtina ji zaniştên zimanî û jêrşaxên wê, geşe bikin. Hiqûq jî ji vê sûdgirtinê bêpar nemaye û nikare bêyî bikaranîna zimaneke tîkûz, zelal û herikbar bibe bingeha misogerîya dadmendîyê. Êdî ziman ne tenê alava biçarçovekirin û dariştina hiqûqê, lêbelê di heman demê da jî, alava bipêşxistin û famkirina wê ye (Udina, 2017: 1338).

Diyarkirina destpêka rast û durişt ya tîkildarîya di navbera ziman û hiqûqê da, wekî du ramanên razber, karekî hêsan nîn e (Udina, hb.: 1338). Bêşik ji destpêka avabûna hiqûqê heta îro, ziman wekî alava dariştina hizirên hiqûqî hatîye bikaranîn. Lê tenê di heyama çend dehsalên dawî da bû ku bi hewil û tîkoşîna zimannasan, şaxeka nû bi sernavê “zimannasîya hiqûqî”yê cihê xwe di nava zimannasîyê da çêkir. Angaştê sereke ya piraîya wan zimannasan jî ew bû ku tu pergaleka hiqûqê nikare bêyî nasîn û bikaranîna zimanî, dadmendîyeka tîkûz û bêkêmasî pêk bîne.

Di derbarê wê mijarê da, sala 1949an pirtûka “Ziman û Hiqûq: Manenasîya Îngilîzîya Hiqûqê” ji aliyê Frederick Arthur Philbrickî (1903- 1952) ve hat weşandin û bi wî awayî jî, rê li ber lêkolînên berfirehtir di wê qadê da vebû (Coulthard & yên din, 2007: 5). Lê cara pêşîn tîgiha “zimannasîya hiqûqî”yê di sala 1968an da, ji aliyê Jan Svartvikî (1931-), zimannasê

swêdî ve û di gotara bi sernavê “The Evans Statement: A case for Forensic Linguistics”ê da hatîye bikaranîn. Wî di wê gotarê da bi rêya analîza girteyên lêpîrsînên sizayî û herweha daxuyanîyên polîsî derbarê doza “Evans”î da bîngeha avakirina zaništa navşaxî ya “zimannasîya hiqûqî”yê danî û ew raştî selimand ku ziman dikare ji bo çareserkirina pîrsgirêkêka hiqûqî rêveker û bikêrhatî be (Svartvik, 1968: 7-27).

Zimannasîya hiqûqî (forensic linguistics) ji hêla zimanî ve ji du peyvan “forensic” bi wateya “hiqûqî” û “linguistics” bi wateya “zaništa zimannasîyê”, pêk hatîye. Di zimanê tirkî da berginda bêjeya “forensic”ê bêjeya “adli” hatîye bikaranîn. Di wêjeya hiqûqî ya farisan da jî bikaranîna bêjeyên wekî “qanûnî”, “dadî” û “hiqûqî” bûye sedema tevlihevîyeka mezin ya zimanî. Herweha di dîyalekta soranî da ev têgih wekî “dadwerî”yê hatîye wergerandin (Talebanî, 2014: 195). Bi nêrîna me baştirîn bergind ji bo bêjeya “forensic”ê bêjeya “hiqûqî”yê ye ji ber ku di zimanê kurdî da bêjeyên qanûn û dadê tu caran wekî sernavê şaxê zaniştî ya hiqûqê nehatine bikaranîn û nikarin wê hizira giran ya zaniştî di nava xwe da bihewînin. Herweha li gor naveroka pîranîya ferhengên hiqûqê, peyva “qanûn”ê berginda bêjeya îngilîzî ya “code”ê û têgiha “dad”ê jî wekî berginda “justice”ê hatine bikaranîn. Li ser vî esasî jî bi me “zimannasîya hiqûqî” baştirîn bergind e ji bo têgiha “forensic linguistics”ê.

1. Pênaseya Zimannasîya Hiqûqî

Ji alîyê zimannasan ve gelek pênaseyên cuda ji bo zimannasîya hiqûqî hatine pêşkêşkirin. Michael Toolan zimannasê Îngilîstanî di pênaseya zimannasîya hiqûqî da dibêje ku:

“Di çend salên dawî da bi zanebûn lêkolînên zimannasîyê di qada hiqûqê da geşe kirine bi awayekî ku pîranîya wan lêkolînan dikarin di jêr sîwana zimannasîya hiqûqî da cih bigirin. Di vê şaxa nû da hiqûq dibe mêvandarê zimanî û jê sûdê werdigire ...” (Toolan, 2009: 1-5).

Herweha li gor nêrîna John Olssonî, zimannasîya hiqûqî dihê wateya, “bikaranîna zimannasîyê di çareserkirina pirsgirêkên hiqûqî da” (Olsson, 2004: 2). Olsson herweha pênaseyeka din jî pêşnîyaz dike û dibêje ku: “Zimannasîya hiqûqî dihê wateya bikaranîna zaniştî zimannasîyê di çareserkirina pirsgirêkeka hiqûqî da.” (Olsson, hb.: 1- 2).

Lê bi giştî, mirov dikare bi berçavgirtina wan pênaseyan û herweha bi bingehgirtina hêmanên bingeîn yên ku zimannasîya hiqûqî pêk diînin, vê pênaseyê pêşkêş bike: Zimannasîya hiqûqî wekî navbesta ziman û hiqûqê, yek ji şaxên nû yê zimannasîya pêkarî ye ku hewil dide bi sûdgirtina ji lêkolînên zimanî, kêşe û pirsgirêkên hiqûqî çareser bike.

2. Zimannasîya Hiqûqî Di Asta Navxweyî û Navnetewî da

Îro her derê dinyayê bi giringîya zimannasîya hiqûqî hesîyaye û li her welatekî ji bo bipêşxistin û sûdgirtina ji wê navşaxa zaniştî pêngav dihên avêtin, bi awayekî ku êdî nîqaşên têkildarî wê zaniştê ji çar dîwarên dadgehê jî derketine û ew navşax bûye mijara waneyên zanîngehan û babeta perwerdehiyê. Wekî mînak li zanîngehên Aston, Hofstra, Cardiff, York û gelek zaningehen din, perwerdehiya zimannasîya hiqûqî wekî şaxeka zaniştî dihê dayîn (Gao, 2010: 55 -75). Cihê amajeyê ye ku ew geşedan berîya dehsala 90î ya zayînî gelekî hêdî û berteng bû û tenê qadên wekî mikurhatinên bertawanan, dengên qeydkirî, taybetmendiyên zimanê polîsan, dozên penaberîyê, dozên taybet bi markeya bazirganîyê û hwd. li xwe digirtin. Lê di heyama wan sê dehsalên dawî da, leza geşedana wê zaniştê gelekî zêde bûye. Bi awayekî ku li gelek welatan êdî darizandin, bêyî amadebûna zimannasên pispore yên perwerdedîtî pêk nahê.

Di asta navneteweyî da jî gelek sazgeh û rêxistinên têkildarî wê mijarê hatine avakirin. Wekî mînak mirov dikare amajeyê bi “Komeleya Navneteweyî ya Zimannasîya Hiqûqî” û herweha “Komeleya Navneteweyî ya Fonetîk û Akustîka Hiqûqî” bike (Tomblin & yên din, 2012: 6). Herweha li gelek welatan, konferansên navneteweyî yên têkildarî zimannasîya hiqûqî, salane

dihên lidarxistin. Ji alîyekî din ve jî, gelek kovarên navdar yên têkildarî babeta zimannasîya hiqûqî dihên weşandin. Wekî mînak mirov dikare amajeyê bi Kovara Navneteweyî ya Zimannasîya Hiqûqî û Kovara Navneteweyî ya Gotar, Ziman û Hiqûqê bike (Axa Gulzade, 1386: 195- 197).

Mixabin li herême û bi taybetî li çar welatên Îran, Tirkîye, Îraq û Sûrîyeyê, tu giringî bi zimannasîya hiqûqî nehatîye dayîn. Herçiqas ku gelek gel û neteweyên cuda di sînorên wan welatan da dijîn û her yek ji wan neteweyan jî -bi taybetî gelê kurd ku kêmara herî zêde ye di van çar welatan da- bi çend dîyalekt û devokên cuda dipeyivin, nebûna fermîyeta hiqûqî di pergala qanûnî ya wan welatan da, bûye sedem ku gelek dozên têkildarî zimannasîya hiqûqî bêncam bimînin yan bi awayekî nedadmendane bihên çareserkin.

3. Mijarên Sereke Di Zimannasîya Hiqûqî da

Di zimannasîya hiqûqî da mijar û babetên cihêreng cih digirin ku her yek ji wan mijaran dikarin di çareserkirina gelek dozên hiqûqî û medenî da rêxweşker bin. Mijarên wekî dengnasîya hiqûqî (forensic phonetics), manenasîya hiqûqî (forensic semantics), dîyarkirina danerê berheman (author identification), transkrîpsîyona hiqûqî (forensic transcription), analîza/dahûrandina hiqûqî ya destxetan, markeyên bazirganî (trademark), nixandina belgeyan ji hêla zimanî ve, şîroveya girêbest û peymanan, hilsengandina dozên sizaxwazîyê, dîyarkirina şahidîyên derew û hwd. hin ji wan mijaran e ku di pêvajoya darizandinê da li ber çavan dihên girtin û em dê li gor derfeta vê gotarê, amajeyê bi hinan ji wan bikin.

3.1. Dengnasîya Hiqûqî (Forensic Phonetics)

Dengnasîya hiqûqî yek ji jêrşaxên giring yên zimannasîya hiqûqî ye ku tê da mijarên wekî venasîna axaftinê, venasîna axiverî (kesayetnasî), teşhîskirina axiverî, teqezkirina axiverî û herweha dîyarkirina raştî yan derewbûna lêgerînên telefonî cih digirin (Hollein, 1990: 190- 191). Di

vê beşê da zimannasê hiqûqî hewil dide ku têkilîya di navbera dengê bertawanê/î yê ku di dema pêkanîna tawanê da hatîye qeydkirin û dengê ku piştî girtina wî hatîye qeydkirin zelal bikin û dîyar bike ku ka gelo çavkanîya her du dengan yek e yan na (Olsson, hb.: 8 -9).

Bêguman taybetbûna dengê mirovî û texmînbarîya guherînên dengê mirovî dibe sedem ku zimannasên hiqûqî bikarin bi rêya sûdgirtina ji dengnasîya hiqûqî, bêjerê dengên qeydkirî dîyar bike. (Coulthard, 1997: 287302-). Bi nêrîna hiqûqnasan her çawa ku her kes xwedî tilîşopeka (pencemor) taybet e û mirov dikare bi sûdgirtina ji wê taybetmendîyê nasnameya xwedîyê tilîşopê dîyar bike, herweha dikare bi sûdgirtina ji taybetmendîyên dengî û bi rêya zanişta dengnasîya hiqûqî xwedîyê resen yê wî dengî dîyar bike. (Terenûm, 1387: 9; Efrasîyabîyan & yên din, 1394: 3).

3.2. Dîyarkirina Danerên Berheman

Rojane bi sedan dozên hiqûqî yên derheqê dîyarkirina danerên berhemên zaniştî yan hunerî da, li welatên cuda dihên vekirin ku çareserkirina wan dozan bêyî sûdgirtin û bikaranîna zimannasîya hiqûqî ne pêkan e. Dîyardeya dizîna berhemên zaniştî û edebî (pirtûk, gotar, nivîsar û hwd.) dîyardeyeka kevn e; lêbelê îro roj, dadgeh bi sûdgirtina ji zimannasîyê dikarin rêjeyeka mezin ya wan dozan bi awayekî dadmendane çareser bikin. Ji ber ku peyvên bikarhatî, rêziman, raştîvîsîn, rêkxistin, riştesazî, manenasî û gelek taybetmendîyên din yên zimanî ji herêmekê ji bo herêma din û ji nivîskarekê/î ji bo nivîskareka/î din cuda ne. Zimannas dikarin bi berawirkirina berhema nakokbar û nimûneyên berê yên alîyên dozê, bi rêya analîza wan hêmanên navborî, xwedîyê nivîsînê dîyar bikin (Ghasemi, Ariani & yên din, 2014: 223).

3.3. Transkrîpsiyona Hiqûqî (Forensic Transcription)

Îro yek ji delîlên alîkar ku di safîkirina gelek dozan da dihê bikaranîn,

forma nivîskî ya birêkûpêk ya deng û vîdeoyên têkildarî dozê ne ku ji hêla dozgerê giştî yan alîyên dozê ve pêşkêşî dadgehê dihên kirin. Transkrîpsîyona hiqûqî êdî di pergalên hiqûqî yên hemû welatan da hatîye qebûlîkirin û derbasdar e û dihê wateya nivîskîkirina naveroka deng yan vîdeoyên ku di dadgehê da wekî belgeyê dihên bikaranîn û herweha dîyarkirina ku kî, kengî (di nava deng yan vîdeoyê da), çi, çawa û bi çi maneyê diîne zimanî, (Fraser, 2018: 586).

Amadekirina deqên nivîskî ya wan deng û vîdeoyan ne karekî hêsan e û pêwîst e ji alîyê pisporê zimanî ve bihê kirin. Carinan ew deng û vîdeo ji alîyê polîsan ve dihên qeydkirin, carinan jî bi awayekî nihênî ji alîyê qurbanî yan alîyekî dozê ve dihên amadekirin. Gelek caran ew deng û vîdeo ne ewqas biqalîte ne ku her kes bikare wan transkrîp bike. Ew xerabîya qalîteyê û transkrîpsîyona ku ji alîyê kesên ne pispor ve bihê kirin, dikare bibe sedema gelek şaşîyan û ew şaşî jî dikarin bandoreka neyînî li encama dozê bikin. Herweha cudabûna ziman, dîyalekt yan devoka axiverê/î wan deng û vîdeoyan li gel kesê ku karê transkrîpê pêk diîne, dibe sedema şaşîyên berfireh. Ji ber ku peyvek, frazek yan bi giştî awayê derbirîna hevokê dikare di zimanekî, dîyalektekê yan devokê (cuda) da xwedî maneyeka taybet û cuda be. Bêguman bêyî alîkarîya zimannasan û sûdgirtina ji azmûna (tecrîbe) wan, di wê hêlê da, her awayê transkrîpsîyona deng û vîdeoyan, dê tijî şaşî bin û bikaranîna wan wekî delîl û belge ji alîyê dadgehê ve jî dê bibe sedema nedadmendbûna pêvajoya darizandinê (Fraser, 2003: 203- 226).

3.4. Hilsengandina Dozên Penaxwazîyê

Yek ji mijarên din yên hiqûqî ku dikare bi rêya zimannasîya hiqûqî bihê çareserîkirin, hilsengandina dozên penaberîyê û derxistina rastîyên têkildarî wan dozan ji alîyê wan welatan e ku wekî behîsta penaberan dihên dîtin. Zimannasên hiqûqî dikarin bi rêya lêkolînên zimannasîyê dîyar bikin ka

gelo penaxwaz, penaber yan koçber di esilê xwe da hevweletîyên kîjan welatî ne, (Eades, 2009: 20- 30).

3.5. Analîza Hiqûqî Ya Destxetan

Ji hêla hiqûqê ve her deqeka destnivîs ku xwedî bareka hiqûqî be yan ku di têkilîyeka hiqûqî da derbasdar be, dikare di dadgehê da wekî belgeyê bihê bikaranîn. Ev jî ji ber ku şewaza nivîsîna her kesekî cuda ye, destxeta tu kesî ji sedî sed naşibe tu kesên din, (Srihari, 2002: 857). Mirov dikare bibêje ku destxeta her mirovekî mîna tilîmorê taybet û cuda ye. Li ser vê bingehe jî zimannas dikarin bi rêya lêkolînên zimannasîyê nivîskarên wan deqan dîyar bikin. Ji hêla hiqûqa medenî ve wesîyet û girêbestên destnivîs û ji hêla hiqûqa sizayî ve jî dîwarnivîsk û herweha nivîs (peyv, rîste, deq) û nameyên gefbar mînakên herî berçav in ku di nava dozan da dihên dîtin.

3.6. Markeyên Bazirganîyê

Markeya bazirganîyê dihê wateya her nîşane yan hêmayeka şênber ya cudaker ku nîşandera berhem yan xizmeteka taybet be, (Tiersma, 1999: 121; Blackett, 1998: 1). Tu markeyek ji bilî rewşa bikarneanîyê ji nav naçe û kesayetîya şirketê heta asteka zêde, girêdayî markeya bazirganîyê ye, (Hutton, 2009: 121). Li gor qanûnê tu kesekî heqîqî yan hiqûqî nikare markeyeka bazirganî bi kar bîne ku di bazarê da hebe û navdar be. Wekhevîya markeyên bazirganî ji hêla sembol, nivîs, dengsazî û hwd bûye bingeha nakokîyan di gelek dozên navxweyî û navneteweyî da, (Axa Gulzade, hb.: 199200-). Navdartirînê wan dozan, “Doza Şirketa McDonald’s Corp”ê li dijî “Şirketa Quality Inns Int”ê û “Doza Aveda Corp.”ê li dijî “Evita Marketing”ê ne ku em dê di beşa bihê da amajeyê bi wan bikin.

4. Zimannasîya Hiqûqî û Çareserkirina Dozên Hiqûqî

Heta îro gelek dozên medenî û sizayî bi rêya sûdgirtina ji zimannasîya

hiqûqî hatine çareserkirin; lêbelê em dê di vê gotarê da tenê amajeyê bi çend dozên hiqûqî yên navdar bikin ku di qada zimannasîya hiqûqî da bûne sedema geşedanê. Di rêza yekem da “Doza I. Charles” cih digire ku vedigere sedsala 17an ya zayînî. Rast e ku ew doz gelek kevn e, lêbelê yek ji wan dozan e ku giringîya ziman û zimannasîyê di çareserkirina dozan da nîşan dide. Piştî wê jî em dê amajeyê bi Doza Evansî bikin ku yekem doz e ku bi rêya zimannasîya hiqûqî (wekî zanişt) hatîye çareserkirin. Têkildarî markeyên bazirganî jî her wekî me amaje pê kir, du dozên navdar dê bihên pêşkêşkirin.

4.1. Doza Charlesê Yekem (16001649-)

Kevntirîn doza ku bi sûdgirtin ji zimannasîya hiqûqî gihiştîye encamê doza “Charlesê Yekem” Kralê Brîtanyayê bû. Di 30ê Kanûna Paşîn ya sala 1649an da, serê wî ji alîyê serbirekî nenas ve û li ber çavê gelî bi bivirî hat jêkirin. Serbirî ji bo ku nehê naskirin serê xwe girtibû û kesî nedikarî rûyê wî bibîne. 11 sal piştî serjêkirina Charlesê Yekem, kurê wî li ser textê desthilatdarîya Brîtanyayê rûnişt û hemû kesên ku beşdarî wê serjêkirinê bûbûn darizandin. Lêbelê ji ber ku serbirê bavê xwe nedinasî mecbûr ma ku bi rêya dengnasîyê, lêkolîna peydakirina kujerê bavê xwe berdewam bike. Piştî demeka kurt, dadgehê bi rêya dengî serbir tesbît kir û bi wî awayî jî, cara yekem dadgehekê di dozeka hiqûqî da sûd ji wê zaniştê girt, (Qurbanî, r. 7).

4.2. Doza Timothy John Evansî (19241950-)

Evans sala 1924an li Walesê hatibû dinyayê û ji ber rewşa derûnî ya taybet nikarîbû hînî xwendin û nivîsînê bibe. Bi armanca ku bikare ji hêla aborî ve bi pêş bikeve, berê xwe da Londonê. Herçiqas ku ji hêla aborî hêj rewşa wî xerab bû jî lêbelê zewicî û bû xwedî zarokeka keç. Hatina zarokê nikarîbû derûnîya wî baş bike û dema ku hevjinê wî ji bo cara duyem ducanî bû, guşara derûnî li ser wî kesî hîn jî zêdetir bû, (Knowles, 2015: 32).

Roja 30ê çirîya pêşîn ya sala 1949an Evansî serlêdana polîsan kir û li kuştina jin û zaroka xwe mikur hat. Termê kuştîyan, di malê da hat dîtin û li gor lêkolînên pizîşkîya hiqûqî her du hatibûn fetisandin. Polîs di lêpîrsînên xwe da negihîşt encameka cuda û dadgehê jî lêkolîn di heman çarçoveya angaşnameya dozgerî da dewam kir û biryara tawanbarbûna Evansî da. Sizayê ku jê ra hat erêkirin sizayê kuştinê bû. Sê meh bi şûn da Evans li Zîndana Pentonvilleyê hat bidarvekirin.

Her wekî me li jor amaje pê kir, zimannasê swêdî Jan Svartvik sala 1968an lêkolîneka berfireh derbarê doza Evansî da kir. Svartvik piştî xwendina girteyên vepîrsînê û herweha girteyên dadgehê, bi wê raştîyê hesîya ku di raştî da Evans bêtawan e. Evansî di dadgehê da amaje bi vê xalê kiribû ku tenê armanca mikurhatinê wî rizgarbûna ji îşkence û guşarên polîsî bû. Deqa mikurhatinê jî ku Evans îmza kiribû ji alîyê polîsan ve hatibû amadekirin û di lêkolînên Svartvikî da derket holê ku herî kêr 4 hevok ne hevokên Evansî bûn. Angaşta Svartvikî ev bû ku ev çar hevok ji hêla rêzimanê ve, ne mîna hevokên din bûn û ne pêkan e ku ji alîyê Evansî ve hatibin gotin, (Svartvik, 1968: 9- 25).

Herweha Evans di dadgehê da amaje bi navê “John Reginald Christie”yê, wekî bikerê tawanê kiribû lê ji ber ku tu belgeyeka selmîner derbarê tawanbarbûna wî da neket destê dadgehê, nehat darizandin. Di encama lêkolînan da û piştî ku hin raştîyên din derbarê dozê da eşkere bûn, di sala 1966an da, dadgehê cardin doz vekir û ji bo Evans biryara “Efoya Paşîn” da lêbelê nîqaşên hiqûqî derbarê vê dozê da, bûn sedem ku sizayê mirinê li Brîtanyaya Mezin bihê sekinandin, (Knowles, hb.: 32- 38).

4.3. Doza Şirketa Quality Inns Intê Li Dijî Şirketa McDonald’s Corpê

Sala 1988an Şirketa Quality Inns Intê plansazîya avakirina 200 rêzêhotelên nû, bi sernavê “McSleep Inn”ê kir. Demeka kurt bi şûn da, Şirketa “McDonald’s Corp”ê bi angaşta ku di sernavê rêzêhotelan da sût di pêşgira “Mc”ê hatiye girtin, daxwaz ji vê şirketê kir ku paşgira “Mc”ê bi

kar neîne. Lêbelê vê şirketê ew daxwaz red kir û ji bo selmandina hiqûqî ya mafdarîya xwe serî li Dadgeha Federal da û li dijî Şirketa McDonald's Corpê doz vekir, (Shuy, 2002: 95- 109).

Dadgehê ji bo ku rastîya herfên “Mc”ê ya ku di sernavê Şirketa McDonald's Corpê da hatîye bikaranîn baştir fêm bike, sûd ji zaništa zimannasîya hiqûqî girt. Piştî lêkolînên zimannasan, dadgehê di biryara xwe da amaje bi vê xalê kir ku herfên “Mc”ê li kêleka peyveka jenerîk (gelemper), êdî wateyeka taybetî girtîye û di çavê mirovan da hertim wekî “McDonald”ê dihê dîtin. Herweha sûdgirtin ji herfên “Mc”ê di sernavê rêzeşirketa “McSleep Inn”ê da, dê bibe sedema wê bawerîya şaş ku ew rêzeşirket girêdayî Şirketa McDonaldê ye yan piştgirîya aborî jê digire yan têkilîyek di navbera wan da heye yan jî bi kêmanî xebata wê ji alîyê Şirketa McDonaldê ve hatîye erêkirin. Loma jî biryar da ku Şirketa Quality Innsê ku sûd ji markeya bazirganîyê ya Şirketa McDonald girtîye, wekî berpîrsîyar îlan kir (Dêhقان & Hêyderî, 1397: 57).

4.4. Doza Aveda Corpê Li Dijî Evita Marketingê

Di sala 1989an da Şirketa Doza Aveda Corpê ku di karê hilberîna berhemên paraştina mû û çermî da dixebitî, li dijî Şirketa Evita Marketingê doz vekir, (Efrasîyabîyan & Montezêrî, 1394: 3). Evita Marketing jî ku di sala 1987an da hatibû damezirandin, di karê hilberîna şampo û hin berhemên din da dixebitî. Her du şirketan berhemên giranbiha û taybet çêdikirin lêbelê Şirketa Aveda Corpê li bazara DYA û Ewropayê, pir navdar bû. Bikaranîna peyva “Evita”yê di sernavê Şirketa Evita Marketingê da, bû sedema wê angaşte ku markeya bazirganîyê ya gilîker bi wî karî hatîye binpêkirin û bi awayeka derqanûnî sûd ji navdarîyê vê şirketê hatîye girtin. Dadgeh ji bo ku bikare biryareka dadmend bide, di vê dozê da daxwaza alîkarîyê ji zimannasên pispor kir. Zimannasan di lêkolînên xwe da amaje bi wê xalê kir ku sernavê şirketê gilîlêkirî ji hêla dengsazîyê ve pir nêzîkî sernavê şirketê gilîker e. Herweha amaje bi wê xalê kirin ku li

gel hebûna cîyawazîyê di navbera di tîpên ‘d’ û ‘t’yê da, dema ku ev tîp dikevin navbera peyvê, xwedî dengên wekhev in. Herweha du tîpên ‘i’ û ‘e’ jî bi heman awayî dikarin bi awayekî wekhev bihên bilêvkin, (Axa Gulzade, hb.: 200- 201).

Dadgehê piştî wergirtina encama lêkolînên zimannasî, derbarê vê dozê da ragihand ku delîl wê rastîyê diselmînin ku qanûn ji aliyê Şirketa Evita Marketingê ve hatîye binpêkirin û wekhevîya şikilî û dengî ya sernavê şirketê bûye sedema şaşîyê di nava bikirên du şirketan da. Li gor biryarê jî Evita Marketing tawanbar hat nasîn û mecbûr ma tezmînatê bide û sernavê xwe jî biguherîne.

4.5. Doza Unabomberî

Yek ji navdartirîn dozên hiqûqî yên ku bi rêya zanişta zimannasîya hiqûqî gihiştîye encamê, doza “Theodore J. Kaczynskiyî” ye ku wekî “Unabomber”î dihê nasîn. Kaczynski matematîknasekî jêhatî lê dijminê sondxwarî yê teknolojîyê bû. Li gor nêrîna wî, dê rojekê teknolojî mirov û mirovahîyê di nava xwe da bihelîne û tune bike (Kaczynski, 1995). Wî ji sala 1978an heta sala 1995an li 16 cihên cuda bombeyên destsaz danîn û bû sedema mirin û birîndarbûna 26 kesan, (Barnett, 2015: 60). Di heyama wan salan da, hemû lêkolînên polîsî yên derbarê wî da bêncam man û polîsan nikarîbû çêker û danerê wan bombeyan peyda bike. Heta ku sala 1995an, nivîsarek 35 hezar peyvî derbarê nêrîn û bîr û boçûnên Kaczynskiyî da, di her du rojnameyên “The Washington Post” û “The New York Times”ê da -bi sernavê “Civaka Pişesaz û Pêşeroja Wê” - hat weşandin. Herçiqas ku rêkerê nivîsarê ne dîyar bû, lê li gor daneyên heyî, ew nivîs ji aliyê Kaczynskiyî ve hatibû nivîsîn û wekî “Manîfestoya Unabomberî” hat nasîn.

Piştî weşandina manîfestoyê ji aliyê rojnameyên navborî ve, FBIyê daxwaz ji zimannasê hiqûqî Roger Şuyî kir ku nivîsara Unabomberî ji hêla zimannasîyê ve tehlîl bike da ku taybetmendiyên zimanî yên wê

derkevin holê û bi wî awayî jî dîyar bibe ku ji alîyê kê ve hatîye nivîsîn (Leonard & yên din, 2017: 885). Di vê navberê da polîsî daxwaz ji her kesî kir ku manîfestoyê bi çavekî hûrbîn bixwînin, belkî bikarin nivîskarê wê binasin. Weha bû ku nivîsarê bala bira û jinbiraya Kaczynskiyî kişand û ew du kes pê hesîyan ku gelek biwêj, hevok, bêje û ramanên ku di nivîsê da cih digirin, dişibin yên ku Kaczynskiyî her roj di nîqaşên xwe da bi kar dianîn. Li ser vî esasî jî wan serlêdana ofisa polîsan kir û nêrîna xwe ji FBIyê ra got û Kaczynskiyî hat girtin.

Piştî girtina Kaczynskiyî, yek ji sedemên ku polîs û FBI qani kir ku ew heman Unabomber e, encamên lêkolînên Shuy bû. Wî di encamnameya lêkolîna xwe da derbarê Manîfestoya Kaczynskiyî, temen, herêma zimanî, asta zanîstî, pisporî û pêşîneya wî ya dîni jî bi durîstî texmîn kiribû, bêyî ku nasyarîyek li ser kesayetîya Kaczynskiyî hebe (Leonard & yên din, hb.: 886). Di dawîyê da jî Kaczynski li xwe mukir hat û tawanên xwe qebûl kirin û bi zîndanîkirina sermedî hat sizadan.

4.6. Doza Christopher Colemanî (1977-)

Doza dawî ku em dixwazin amajeyê pê bikin, doza Christopher Colemanî zêrevanekî şexsî ye ku jin û du zarokên wî di sala 2009an da di bûyereka trajîk û tarî da hatibûn fetisandin. Berîya kuştina wan, di nava çend mehan da, çend nameyên gefbar yên destnivîs û herweha çend nameyên elektronîk ji wan ra hatibûn şandin, lê polîsî nikarîbû rêkerê wan nameyan dîyar bike. Roja bûyerê jî piştî amadebûna polîsan li mala Christopherî, derket ku kujerê jin û zarokan piştî kuştina qurbanîyên xwe, çend hevokên dilêş û gefbar li ser der û dîwarên malê nivîsîne.

Lêkolînên sizayî bi lêpirsîna Christopher Colemanî dest pê bûn ku wî îdîa dikir ku dema qewimîna bûyerê li ser karê xwe bûye. Piştî ku polîsî dozgerî nekarî tu delîlan li dijî wî bibîne ew berdand û tenê di destê wan da dîwarnivîsk, nameyên destnivîs û nameyên elektronîk man. Ji bo dîyarkirina kujerî, daxwaz ji profesor Robert Leonardî, zimannasê hiqûqî

hat kirin ku bi rêya zimannasîya hiqûqî alîkarîya çareserkirina wê dozê bike.

Leonard pê hesîya ku gelek ji hevokên li ser der û dîwarî bi tîpa “F”yê dest pê dibin. Bi berawirdkirina wan dîwarnivîskan li gel nameyên destnivîs derket holê ku tîpa “F”yê di hemûyan da bi awayekî wekhev hatîye nivîsîn. Herweha wî zimannasî, amaje pê kir ku li gor daneyên zimannasîyê nameyên elektronîk û nameyên destnivîs jî ji aliyê heman kesî ve hatine nivîsîn. Ji ber ku ji hêla rastnivîs, rêziman, rîstesazî, bêjeyên bikarhatî û naveroka xwe ve, ew û ya gefbar pir dişibîyan hevûdin û nivîskarê wan nameyan û kesê dîwarnûs li gor Leonardî heman kes bû. Herî dawî encama lêkolînên li ser kompûtera Christopherî dîyar kir ku ew kompûter rasterast ji bo şandina nameyên elektronîk hatîye bikaranîn bêyî ku bihê hakkirin (hacking). Yanî rêkerê nameyên elektronîk, nivîskarê nameyên destnivîs û dîwarnivîskan heman kes bû û ew jî Christopher bû.

Piştî darizandinê, li ser bingeha delîlên zimanî derket holê ku Christopherî şeş mehan berîya roja bûyerê ji ber hin sedemên kesane plana kuştina jin û zarokên xwe çêkirîye û dest bi şandina nameyên gefbar kirîye (Leonard & yên din, hb.: 889 -891).

Encam

Hiqûq li ser hîmê zimanî ava dibe û bi pêş dikeve û dadmendîya hiqûqî jî girêdayî ziman û zaniştên têkildarî wê ye. Yek ji wan zaniştan jî zimannasîya hiqûqî ye ku îro roj li piranîya welatên dinyayê wekî yek ji amûrên kartêker di misogerkirina dadmendîya hiqûqî da dihê bikaranîn. Her wekî me amaje pê kir, zimannasîya hiqûqî gelek mijar û babetên cihêreng li xwe digire ku her yek ji wan dikare ji bo çareserkirina hin dozên hiqûqî û medenî yên taybet rêxweşker be. Di nava wan babetan da jî, yên ji hemûyan giringtir dengnasîya hiqûqî, manenasîya hiqûqî, dîyarkirina danerên berheman, transkrîpa hiqûqî, markeyên bazirganî, û hwd. in ku me bi kurtasî qala wan kir. Herweha me bi armanca zelalkirina

mijarê, mînakên wan dozan jî pêşkêş kirin ku bi rêya zimannasîya hiqûqî û lêkolînên zimannasan hatibûn çareserkirin.

Li gor encama vê lêkolînê, giringîya delîlên zimanî di pêvajoya darizandinê da bi taybetî li welatên pirziman û pirdîyalekt, wê raştîyê diselmîne ku damezirînerên tu pergaleka hiqûqî nikarin angaştada dadmendîya wê pergale bikin bêyî ku cih bidin zimannasîya hiqûqî.

Herweha berfirehbûn û geşedanên rojane yê zimannasîya hiqûqî bûne sedem ku ew zanişt di pêvajoya lêpîrsîn, lêkolîn û darizandinê da cih bigire û pisporên zimanî -yên ku perwerdeya taybet ya hiqûqê jî dîtine- bikarin di çareserkirina dozên medenî û sizayî da roleka giring bilîzin.

Çavkanî:

Kurdî:

Komxebata Hiqûqê. (2019), Ferhenga Têgihên Hiqûqê, ed. Mîkaîl Bilbil, Sabîr Ebdulahîzad, Weqfa Mezopotamyayê, Îstanbul.

Talebanî, N. (2006), Ferhanga Qanûnî, Mekteba Bîr û Hişyarîy, Silêmanî.

Îngilîzî:

Barnett, B. A. (2015), "20 Years Later: A Look Back at The Unabomber Manifesto", Perspectives on Terrorism, Vienna, 9 (6), rr. 60 -71.

Blackett, T. (1998), Trademarks, Macmillan, London.

Coulthard, M. (1997), "A Failed Appeal, in Forensic Linguistics", International Journal of Speech Language And The Law, Sheffield, 4 (2), rr. 287- 302.

Coulthard, M. & Johnson, A. (2007), An Introduction to Forensic Linguistics. 1. edition, Taylor & Francis Ltd., London.

Eades, D. (2009), "Testing The Claims of Asylum Seekers: The Role of Language Analysis",

Language Assessment Quarterly, 6 (1), rr. 30- 40.

Fraser, H. (2003), Issues in Transcription: Factors Affecting The Reliability of Transcripts As Evidence in Legal Cases, School of Languages Cultures and Linguistics, University of New England: Biddeford.

- Fraser, H. (2018), "Forensic Transcription: How Confident False Beliefs About Language and Speech Threaten The Right to A Fair Trial in Australia", *Australian Journal of Linguistics*, Australia, 38 (4), rr. 586606-.
- Gao, J. (2010), "Review and Prospects of The Research of Forensic Linguistics in China", *The Journal of Asian Social Science*, Canada, 6 (10), rr. 55 -75.
- Ghasemi, M. A., Sajedi, F., Sajedi, M. (2014), "Forensic linguistics: A Brief Overview of The Key Elements", *Procedia - Social and Behavioral Sciences*, United Kingdom, Volume 158, rr. 222 – 225.
- Hollein, H. (1990), *The Acoustics of Crime*, Plenum, London.
- Hutton, Ch. (2009), *Language, Meaning and The Law*, Edinburgh University Press, Edinburgh.
- Kaczynski, T. J. (1995). "Industrial Society and Its Future", *Washington Post*, Washington, Sept. 19, 1995.
- Knowles Q. J. B. (2015), "The Abolition of The Death Penalty in The United Kingdom: How It Happened and Why It Still Matters", *The Death Penalty Project*, London.
- Leonard, R. A., Ford, J. E. R., Christensen, T. K. (2017), "Forensic Linguistics: Applying The Science of Linguistics to Issues of The Law", *Hofstra Law Review*, New York, 45 (3), rr. 881 -897.
- Olsson, J. (2003), *What is Forensic Linguistics?*, Nebraska Wesleyan University, England.
- Olsson, J. (2004), *Forensic Linguistics: An Introduction to Language, Crime, and The Law*, Continuum, London.
- Primeau, E. (2015) "The Importance of Forensic Transcription"
<https://www.primeauforensics.com/the-importance-of-forensic-transcription/>
(tebax 16, 2019)
- Shuy, R. (2002), *Linguistic Battles in Trademark Disputes*, Palgrave Macmillan, London.
- Srihari, S. N., Cha, S. H., Aurora, H., Lee, S. (2002), "Individuality of Handwriting", *Journal of Forensic Sciences*, Colorado, 47(4), rr. 1 -17.

- Svartvik, J. (1968), *The Evans Statements: A Case For Forensic Linguistics*, University of Gothenburg Press, Gothenburg.
- Tiersma, P. M. (1999), *Legal Language*, University Of Chicago Press, Chicago.
- Tomblin, S., MacLeod, N., Sousa, S. R., Coulthard, M. (2012), *Proceedings of The International Association of Forensic Linguists*, Centre for Forensic Linguistics, Birmingham.
- Toolan, M. (2009), *Forensic Linguistics*, Rutledge, London.
- Udina, N. (2017), "Forensic Linguistics Implications For Legal Education: Creating the Textbook on Language and Law", *Procedia, Social and Behavioral Sciences*. Almeria, 237, rr. 1337- 1340.

فارسی:

- استاجی، اعظم (1985). «معرفی آواشناسی قانونی و برخی کاربردهای آن»، *مجله زبان و زبان شناسی*، س 2. ش 2. پیاپی 4. ص 149-156.
- افراسیابیان، حسین، زهرا، منتظری (1394)، *کاربرد زبان‌شناسی در علوم قضایی ایران*، کنفرانس سالانه رویکرد نوین پژوهشی در علوم انسانی، موسسه مدیران ایده پرداز پایتخت ویرا: <https://www.sid.ir/FileServer/SF/3811394H0135.pdf>
- آقاگل زاده، فردوس؛ زبان شناسی حقوقی: (قانونی): رویکردی نوین در زبان شناسی کاربردی، بخارا مهر و آبان 1386 شماره 6. ص 192-204.
- ترنم، افشار، کاربرد زبان‌شناسی حقوقی در تحقیقات جنایی، کارآگاه: تابستان 1387، دوره 2، شماره 3؛ ص 6-16.
- دهقان، مسعود، حیدری، بهمن، بررسی ویژگی های سبک کلامی گروهک منسوب به داعش، پژوهش های زبان شناسی سال دهم پاییز و زمستان 1397 شماره 2 (پیاپی 19)، ص 55-66.
- عالیخانی، محمد (1380) *حقوق بین الملل*، خط سوم: تهران.
- قربانی، رضا، کارشناس چگونه می تواند در آواشناسی برای مقامات محترم قضایی علم آور باشد؟: <http://www.kkrdi.ir/upload/files> آواشناسی 20% مقاله 20% سرهنگ 20% قربانی قضایی.

KURD Û ZIMANÊ KURDÎ

■ Bahadîn Robar

Zimanê zirkmakî ango zimanê dayîkê ji bo hemû gel û neteweyan di heman astê de girîng, pêwîst, jêner û pîroz e. Xwedîlêderketin an jî xwedîlênderketina wî ya ji hêla netewe û axêverên wî zimanî ve vê astiyê naguhere. Lê belê dema mirov li seranserî cîhanê û gelên mîna kurdan bêdewlet dinêre sazî û dezgeh, nivîskar û siyasetmedar, hunermend û zanyar, akademîsyen û pîşesaz, dayîk û bav û hemû beşên wê civakê bi ruhê seferberiyê li zimanê xwe xwedî derkevin. Zimanê îbranî mînaka vê ya herî berbiçav e ku çawa zimanê xwe hatî jibîrkirin û ji hlê rabûyî vejandin û kirin xîm û esasê avakirin dewleta Îsrailê. Mînakên din weke gelê galiç, baskî, katalan, Îskoç û gelek neteweyên din ji bo zimanê xwe yê dayîkê dane li holê ye. Berevajiyê vê gelên li hemberî bişaftin û qedexeyan zimanê xwe ne parastine, ên weke, sûmerî, hitîtî, pontûs, abazî, hemşînî û bisedan yên din an tevahî ji holê rabûne an jî zimanê wan tenê ji hêla çend kesên pîr û kal ve tên axaftin, lewre navê wan tenê di pirtûkaan de maye.

Di vê serdema ku bişaftin ji hemû serdeman hêsantir e de em weke gelê kurd nêzikatî û helwesta dewletên nîjadperest a li hember kurd, kurdî, kurdewarî û Kurdiştanê baş dizanin, lewre hêvî û daxwazên kurdan yên ji bo fermîkirin û di perwerdeyê de bikaranîna zimanê kurdî ya ji dewletên serdest hewlek bêşûd e. Jixwe yên zimanê kurdî asteng, qedexe û tune dikin ew serdest in, yanî di serî tirk û ereb û ecem in ma wê çawa daxwazên me yên ji bo serbestkirin û pêşvebirina zimanê kurdî pêk bînin? Ev karê me bi xwe ye, divê em kurd pêşî ji xwe û malbata xwe, piştî ji cîran û hevalên xwe dest pê bikin û zimanê xwe bi awayek pratîkî bixin zimanê jîyan, huner, wêje, zanîst û siyasetê. Bê têkoşîn tenê bi dilxwaziyê zimanê kurdî ne tê parastin ne jî dibe zimanê fermî û zimanê perwerdeyê. Dema em pêşniyar an jî rexneyek bi vî awayî dikin gelek kes hêrs dibin û dibêjin; ez kurdê herî baş kurdîr û fefakartir û

dilxwaztir im. An jî bi hezaran kes bahaneyên pûç û vala pêşkêş dikin û hewl didin berpirsiyariyê ji stûyê xwe dercin. Lewma hin dibêjin dema min nîn e. Hin dibêjin derfetên min ên aborî nîn e. Hinek dibêjin dijmin destûrê nade. Hin dibêjin kesek nîn e dersê bide min. Hinek dibêjin ev ne kêmasiya min e, ya dê-bavê min e. Hinek dibêjin ferqa zimanan nîn e. Hinek dibêjin zimanê kurdî pere nake. Hinek dibêjin qene zarokên me di dibistanên dewletê de paşve nemînin û bidehan tiştên din rêz dikin. Li gel ku kurd in û di Kurdistanê de dijîn jî ji bo hînê zimanê kurdî (zimanê dayîka xwe) bibin yek xulek, yek panot pere û yek dilop xwîdan di ber de nadin.

Lê dema mirov berê xwe didiyê ji Çînê bigire heta Sibîryayê, ji Misrê bigire heta Emerîkayê, ji Erebiştana Siûdî bigire heta herçar aliyên Ewropayê kurd di bidehan dewletan de dijîn û diçin kîjan dewletê jî di hundirê salek-du-salan de zimanê wî gelî/dewletê bi berdêla pereyên zêde û dema xwe ya herî girîng de hîn dibin û dixin jiyana xwe. Nexwe pirsgirêk ne bahaneyên me li jor qala wan kirî ne. Pirsgirêk di kesayet û ramanên me yên xwebûn, hebûn û netewebûnê de ne. Ji hêla din ve ji bo amadehî û ezmûnên zanîngehan her sal em bi dehezaran lîre, dînar, manat, dolar, euro û hwd. li zarokên xwe xerc dikin û mamoştayên taybet ji wan re digirin. Lê dema mijar zimanê hebûna me be yanî mijar zimanê kurdî be em xwe tavêjin pişt heft derî û heftê bahaneyan. Lê tê dîtin pere jî hene, derfet jî hene û rê û rêbaz jî hene. Tiştê neyî hizrên kurdbûn û xwebûnê ne.

Ez jî dizanim di vê serdema teknîk û teknolojiyê de ku cîhan bûye mîna gundekî û welatê me ji aliyê çar dewletên nîjadperest û zalim ve hatiye desteserkirin û her cure qedexe, biçûkxistin, tunehesibandin, bişaftin û vederkirinê li ser çand û zimanê me dimeşînin lewre pêşxistin û parastina çand û zimên gelek zor û zehmet e. Lê ev nayê wê wateyê

ku dest û lingên me girêdayî ne û em ê teslîmî polîtîkayên asîmîlasyonê bibin. Ka bila her kurdek zimanhez û têgihîştî kesekî din serwext, hişyar û hînî zimanê kurdî bike. Ka hingê ziman azad dibe an na? Dema em her kesên ku hişmendiya neteweyî û hişmendiya zimanê dayîkê pê re heyî xwe erkdar û mecbûr bibînin ku divê em zimanê xwe bidin hezkirin û jiyîn hingê em ê bandorê li siyaset, zanîst û desthilatan jî bikin.

Hêvî û bendewariya min ji we ev e. Divê em ne parsekê zimanê xwe, lê têkoşer û dildarê wî bin. Her roja diçe ji kîsê me diçe. Heke bi awayek lezgîn em kurdî nekin di hemû malên kurd de û hemû zarokên kurd bi kurdî mezin nebin herî zêde piştî du nîfşên din dê zimanê kurdî mîna zimanê lazî û terekemeyî bibe beşek û devokeke zimanên serdestan. Heke em 6070- mîlyon kurd nîkaribin zimanê xwe biparêzin û pêşve bibin hingê xelk çî gotin û heqaretên mezin li me bikin mafê wan e. Zimanê me êmanet û mîrasa dapîr û bapîrên me ye. Wan bi hezarsalan ev ziman paraştin û anîn heta roja me. Divê em ku derfetên me gelek û gelek ji yên wan zêdetir in vî zimanê pîroz sax û selamet êmanetî zarokên xwe bikin.

Bi destûra we ez ê vê mijarê bi serpêhatiyeke pêşiyar biqedînim. «Dibêje zivîstaneke kaya hespê zilamekî xilas dibe. Her der di bin berf û baranê de maye û zilam tu çareseriyê peyda nake. Tenê tiştê di destê wî de mayî ew e ku ji Xwedê lavan bike. Dibêje vî camêrî destê xwe ber bi jor ve bilind kir û got; ya Rebî! tu niha tijî cuherê hespê min ka kî, lê bi Xwedê te nekiriye û tu nakî». Vêca bila ev rexneyeke min be...

**Jibo bîranîna Akademîsyan
Şekroyê Xudo Mihoyî
(1930 – 2007)**

■ Dr. Ibrahim Mahmud

Xwendevanên hêja, heger îro endamê akadêmiya zanistî a Ermenîstanê û Russiyayê, serokê Navenda lêkolînên kurdî li Moskoyê, dîrokzan û kurdperwerê mezin Prof. Dr. Şekiroyê Xudo di nav me de jiya ba, wê timamiya Gelê Kurd û kurdzanan li her deverê 90 saliya ji dayikbûna wî pîroz bikira, lê sed car mixabin ew berî wextê, roja 1ê Sibata 2007 nişkave li bajarê Mosko çu ser heqiya xwe!

Jibo bîranîna vê bûyera giring di dîroka kurdan de, ez dixwazim bi kurtî çend rêzikan li ser Mamoştayê xwe bînim ser kaxezê, lewra Mamoştayê min yê bi qilafetê (bi bejna) xwe ve piçûk, lê bi qedir û ma'rifeta xwe ve, bi zarxweşî û devlikeniya xwe ve, bi mervanî û Kurdperweriya xwe ve, bi nefspiçûkî û mirovaniya xwe ve, bi zanebûn û ronakbîriya xwe ve ve pir' bilind û mezin bû, layîq e ku mirov jibo wî mandî bibe û tucar jibîr neke!

Çiqas ta'î û dilêş be jî, le êdî nema em sohbeta wî a xweş, rûyê wî yê geş, lêvên wî yên li ken, şîretên wî yên bi nirx, dûrbîniya wî a pêşerojê dibînin û dibihîzin... Lê ez bê tirs û bi dengê bilind dikarim bêjim, ku wî mîratekî zanistî û dîrokî pir' dewlemend û bi nirx ji bo milletê xwe hiştiye; navekî mezin, qedrekî bilind û bi hezaran bîranînên xweş li şûn xwe hiştine. Loma jî ewê hertim di dil û hişê xizim, heval, dost, şagirt û milletê xwe de bijî...

Di derheqa mirovekî weha qedirbilind de pir' çetin e ku mirov bikaribe hemû tiştên di dil û hiş de bêne ser ziman û kaxezan, lê tevî wê jî ezê hewil bidim pir' bi kurtî be jî, şêweyê naskirina min û Mamoşte Şekro ji we re bejim, hêvîdar im ku sebra we hebe û heta dawî bixwênin!

Weke her xwendevanekî kurd ê gênc (xort), xemxur û hezkiriyê çand, dîrok û doza gelê xwe, ez jî bi hesret bûm, ku rojekê ji rojan herim nav kurdên Yekîtiya Soviyêt (Y.S.) a berê û gelek kesayetiyên kurd ên navdar nasbikim...

Sala 1982 an, di çarçoveya xwendina xwe a praktîk de li zanîngeha Moskooyê, kolêja Rojnamegeriyê, beşê Radiyo û Televizyonê (R&TV), min weke mirovekî bê paytext û welatekî azad (her xwendevanekî biyanî mafê wî hebû salê du heyvan beşê praktîk li R&TV welatê xwe derbas bike), ji xwe re paytexta Ermenîstanê, Yêrîvan: motka wêje, ziman û rojnamegeriya kurdî a azad, cî û „meskenê“ kurdên Qafqazê helbijart... Demsal havîn bû, li gorî şert û mercên xwendinê, karê min li R&TV Yêrîvanê bû, di nav de jî beşê kurdî; min gelek rewşenbîr, rojnamevan, kurdperwer û navdarên kurdan naskirin, bûme mêvanê wan, ew mêvandariya ku mirov qet jê têr nedibû... Biraştî pir çetine (zehmete) mirov mazûvanî û qedirzanîna wan ji miletê xwe re, bi gotinan pesin bide!!

Di derheqa vê yekê de bi sedan bûyer û serpehatiyên xweş, ku qet nayên jibîrkinê hene... Da ku ez ji babeta xwe bi dûr nekevim, yek ji ciyê ku min dixwest ez binasim beşê dîrok û kurdzaniyê bû... Berî ku ez herim min hin tişt di derheqa wî beşî de, serok û xebatkarên wê de kom kiribûn û bihîstibûn...

Bi alîkariya dostekî em çûne wî beşî... Bi rêve wî dostî ji min pirsî: ma ti Şekroyê Xudo dinasî? Min got Na. ...Wi got: Peyî (ev gotin kurdên Qafqazê weke nîşana ecêbmayîne nîşan didin!) ew lawikekî me yî z`aff jêhatî û li ser xwe ye, ewledekî (kurekî) C`imeta (miletê) me yî lape (herî, gelekî) mezin e... Ew tarîxzanekî e`yan e (xwiyayî ye) û qedrê miletê xwe pir zane, hezkiriyê kurd û Kurdiştanê ye...! Bi gotin û berde wamiya pesindana dostê xwe re em ketin avahiya Instîtûta Rojhelatnasiyê a Ermenîstanê, me berê xwe da beşê kurdzaniyê, otaxa (kurdên me yên Y.S. ji odê re dibêjin) serokê beşê...Tu kes ji xebatkaran li wir nebûn, tenê sekretêrê beşê rûniştî bû; piştî silav û bixêrhatinê, wî got bibaxşînin (bibuhrin) Şekro Xudoyevîç (serokê beşê) di civîna giştî a serokatiya

Akadêmiyê de ye, ewê z`aff dom bike û îro nikarê pêşwaziyê li we bikê...!

Mixabin ji ber karê min li R&TV û çûn û hatina gundên kurdan, min ev serdana xwe xistibû roja herî dawî de ji mana xwe li wir, loma min û dostê xwe bi lav-lavan û kotekî (bi zor) sekretêr razî kir, da ku bi kêmasî here jê re bêjê, wekî wa kurdekî dereke (biyanî) li hêviya te ye û dema wî li Rewanê (Yêrîvan) kêr maye, heger îmkân hebê dixwaze te bibîne ...!

Piştî qasekê (kêliyekê) Mamošte Şekro hate bîroya xwe û bi rûyekî sar, weke ku hezar pirs di mêjiyê wî de diçûn û dihatin, bi xêrhatina me kir û yekser bi nîv henekî, rexne girt û got: ” ... Bavo win kurdên dereke, ne me ji vî halî xelas dikin, û ne jî me bi rehetî dihêlin...” Dema wisa got, weke ti cêrekî ava sar bi serê min de dakê; bi rastî min xwest erd biqelişê û ez tê de winda bibim... Ez têgihîştim, ku min gunehkî mezin kiriye, hema, hema û bi dengêkî nizim di ber xwe de min got: Mamošte tê qisûra min gelekî efû bikê, welahî ev du heftîn e ez li vir im, ha îro, ha sibê min dixwest ez bême ba we, lê ti dizanê, ji vê malê here wê malê û ji vî gundê here wî gundî... Hîn gotina min di devê min de; min dî rûyê wî geş bû, gotin ji devê min revand û pirsî: Ti çûyî Elegezê jî? (ew li gudê Elegezê hatiye dinê) û ti çû filan û bêvan gundî...??! Min her serê xwe bi erêni dihejand... Ma te lawik gişk naskirin? Min got erê. Min dî keniya û ew mirov ê berî kêliyekê bû yekî din; dev li ken, xwînşêrîn, nefspiçûk û zane...Ji nişkave kenî û bi rûgeşî got: kuro weleh tu ecêv î (ecêb î), ti li nav Cime`tê gişkî geriyayî teze ez ketime bîra te...!

Dem a min ev yek dît, min jî hêdî - hêdî ciyê xwe xweş kir û ez hinekî bi ser xwe ve hatim û qederê 1520- xulekan (deqîqan) min tenê bersiva pirsên wî da... Gelkî kêyfa xwe ji min re anî û got ez za`ff şa me (şadim, dilxeşim) wekî cihalêd (gêncê, xortê) wekî we têne vî welatî dixwênin; pispor û şareza gerekî miletê me ne; êd welathiz û miletperwer, nek yên xizmetkarê dijmin.... Birê min -gotina xwe domand- ti min bibexşîne

(bibuhre), ez gerekî vegerime civînê (di ber xwe de kire mine, min û çend xeber jî gotin); ji gotinên wî hate xwiyan ku daxwazên wî di civînê de, ne hatine qebûlkirinê, êdî bi hûrgilî çî bûn, ez nizamim, lê xwiya bû li ser pirs û dîroka kurdan bû... Wê gavê ez têgihêştim çima bi sarî bi xêrhatina min kir?! „, ka emê çî bi hev bikin... Zû zû were, bera e`leqedariya (pêwendiyên) me hebe... Oxir be ji te re û silava li lawikan gişka bike...“ Bi van gotinan xatir ji min xwest... Min jî careke din qisûra xwe jê xwest û her wise xatirê xwe jî... Bawer bikin te digot qeyî ev deh sal in, ku em hev û du dinasin...

Sala pişt re, careke din min ciyê xebata xwe a praktîk Yerîvan û Radiyo ya kurdî helbijart û min ji nêzîk ve Mamoste Şekro û xebata beşê wan yê kurdnasiyê, naskir... ji min re eşkira bû, ku ew ne tenê ronakbîrekî mezin e, belê her wise miletperwer û mirovhezekî nefispiçûk û civatxweş e jî...

Min plana karê dipolma xwe a zanko: ”Filîmekî dokûmêntal li ser jiyana û xebatên kurdên Ermenîstan ê” jê re got. Ew gelkî kêfxweş bû û piştgiriya min kir... Di sala 1984 an de min dest bi kişandina Filîmê xwe li gelek cihan kir û di nav wan de jî beşê Kurdzaniyê, ku wê çaxê ew serokê wê bû. Bi rastî bexteweriyê mezin bû ji min re, dema wî got: ”... Eva cara yekem e, ku kurdekî dereke bi kamêra sînemê beşê me dide nasîn û hevpeyvînê bi min re çê dibe...”

Ji wê çaxê de dan û standina me berdewam bû, ew ji min re bû weke Mamostekî û çavkaniya şewirdanê, loma jî min çar sala şûnde, ew yek ji du Profêsan, weke rexnegirê nama xwe a dektora: ”Tevgera kurd di filîmên dokûmêntal de û Yelmaz Gûney” destnîşan kir û wî jî bi dilgermî qebûl kir û alîkariya xwe bi hemû rengî diyar kir...

Di payîza sala 1989 an de, roja paraştina Nama min, Mamoste ji Yerîvanê hatibû û li pêşiya Komîsyona Zanîngeha Mosko a nîrxandina xebata min, wî jî doktorê zanîstiyê yê helsinker, rexne û pesindana xwe

li ser karê min xwend û nerînên xwe ji beşdar û endamên komîsyonê re pêşkêş kirin...

Herçiqas kurtiya vê gotarê ne ciyê nivisandina hemû xeysetên Mamoste Şekro ye jî; lê ez weke erk ji xwe re dibînim, ku mêrxasiya vî kurdperwerî weke nimûne di bûyerekê tenê de ji bûyerên wê rojê, ji we re eşkîra bikim!

Dema dengdana Komîsyona nirxandina Nama min; li vir pêwîste ez bidim nasîn, ku Komîsyon ji 15 zaniyar û akadêmîkarên Zanîngeha Mosko a dewletê pêk hatibû; yek ji wan, bi navê Azat Aliyevic Ibragîmof, Profêsorê kolêja me bû, ew bi netewa xwe Azerî bû... Ji her 15 Endaman, ew tenê û bi xwîrtî dijî xebata (nama doktora) min derket... Ewî têzek (encamek) ji têzên Nama min "...min nivisandibû, ku di demeke nêzîk de, wê televizyonên kurdî jî bêne avakirinê û wê sîneme û rojnamegeriya kurdî bikevê astekî bilind û nû de..." kire behane (biyanu, hincet) û got: "... ev Name, nameyeke siyasî u neteweperîstî ye, ew zêdetir xeyalên nivîskarî, tiştên wise dûrî raştiye ne..." Hîn wî gotina xwe bi dawî ne anî bû, ji nişkave û bi hêrs mamoste Şekro (bi amadebûna zêdetir ji 50î xwendevan û Mamostên kurd û biyanî) destê xwe hilda, îzna axavtinê xwest û bi dengêkî ji xwe bawer û bê tirs (yên ku Y.S. nas dikin, dizanin ne herkesî diwêra pîrsa nasionalîzmê bi eşkîra bîne ser ziman û nexasime di bûyer û cihekî wise fermî de), wise got:

"... ev tiştê, ku kolegê min (hevpişe ye min - yanî ê Azerî); dibêje tiştêkî xelet û kelevacî ye... Vî xwendevanî ne ji xeyala xwe aniyê, duniya wise zû bi pêşve diçe, û rewşa miletan wise zû tê guhertin ê, wekî wê di demeke nêzîk de ne tenê televizyona kurdî çê bibe, lê belê wê dewleta wî jî bê avakirinê, ev tiştêkî dîrokî ye... Ez dikarim bipirsim: çima wê televizyonên miletêd mayin hebin, lê çire wê mafê kurdan tunebe, ku televizyona wî bê avakirinê..."

Bê pesindan, ew wê kêliyê di çavên mi û yên beşdaran de, nexasime yên kurd de, bû qehremanekî milî... û hema ji nişkave û bê pîlan, hemiyan bi hev re jê re li çepikan xiştin... Gereke bê gotinê, ku Profesore me, yê azerî dema ew gotin, bi wî awayî bihîştin û di serê de jî çepik û dilxwesiya beşdaran, hema serê xwe berda ber xwe û bêdeng ma... Lê dema dengdanê li ser pejirandina xebata min, ji 15 endaman wî bi tenê destê xwe li dij rakir.

Piştî wê û di êvarîna pîrozkirina serketinê de, li xwaringehê, ku nêzîkî 50 kesî hazir bûn, Mamoşte Şekro, weke li her cihê ku lê bûya, dîsan bû bi rêvebir û xweşkerê civatê... Gotinên xweş û şêrîn, pêkenok û laqirdî jê dihatin xwarê, te digot qeyî laqirdiyên hemû netewan li ba wî hatine civandinê... Lê jibo dîrok û heqiyê gereke ez bêjim, ku tevî xebardana wî a xweş û bi ken, serê gotina wî – binê gotina wî dîroka kurdan bû, azadiya gelê kurd bû, geşbîniya (tevî keseran jî) pêşeroja me bû... Kêm kes weke wî dikarîbû babetan bi serkeftin bi hevûdu ve girê bide û bihunê!!

Bi vî hawî (wise) ez jî bûme yek ji hezaran, şagirt û dostê wî zaniyar ê çeleng û jêhatî, rû li ken û qiseşêrîn...

Li gel Mamoşte Şekro, Bonn-Meydana Bethoven, zivîstana 1993

Êdî felekê weha kir, ku ez di Elemaniya de derketim, lê têkilyên me berdewam man... Min jî, weke gelek kes û dezgehan du caran: sala 1993an û 1998an bi taybetî ji bo 100 saliya Rojnamegeriya kurdî (wê çaxê, ez berpirsyarê Kombenda KAWA, bo çanda kurdî bûm. Li Elemaniya) vexwendî Elemaniya kir, ew herdu caran jî bi dilxweşî û bê şert û şîrûtan, hazir bû û gelek rojên serketî û xweş, yên ku qet nayên jibîrkinê, me bi hev re derbas kirin ... Min gelek hevpeyvîn pê re çê kirine, hin ji wana di wextê xwe de hatine belavkirinê, lê hin jî mane, ji ber wê ezê hewil bidim di pêş de wan jî bidme ser hev û bidme nasînê; bi dîtina min ev erkê her dostekî wî ye. Loma jî, baştirîn bîranîna Mamoşta

Şekro ew e, ku her dilsozekî kurdayetiyê, her xemxwirekî dîroka milletê xwe û pêşeroja wî, li mîrata Akadêmîkvan, Profêsor Şekroyê Xudo, a dewlemend xwedî derkeve, bide serhev û bide nasandinê!

P.S.: Gelek pîlan jibo bîranîn û pîrozkirina vê bûyerê û li gelek welat û cihêd mayin hebûn, lê sedcar mixabin di dema me hazir de û jiber vê nexweşiya (Corona-Viros) ku li Cihanê belav bûye, hemû cûreyên çalakiyên mezin hatine rawestandin ê!!! Lê ez bawer im, ku derfet bê, gelê kurd û kurdnasî wî jibîr nakin...

***Rojnama Riataza (12.04.2020)**

<http://berbang-nur.com/?p=6104>

#ŞekroyêXudoMihoyî #KurdênSovyêtê

#Akademîsyen #IbrahimMahmud #RiaTaza #Dîrokzan #lêkolîner